şandên roşinbîrî, mezaxtina şiyan û deman

Îsmayîl Tahir

Dema hizra pêk guhartina şandan diserdemê nû da hatî ye kirin widencamda bûye peyrewek gişt dam ûdezgehên sîyasî û roşinbîrî ûkargêrî wicivakî bi hemî cudahî yên xweve li cîhana serdem êxisitî ye diqalibê bicih înanê da çend merem û armanc û hîvî pê hebûyine ji wan çalakkirina şîyanan û pêk guhartina bîr û boçûnan û xirivekirina şarezayî yan û pêk nasandina keliturên gelan û fêrbûna zimanan ûhtid.., Kurdistan û xelkê Kurdistanê jî li qunaxa piştî serihildana sala 1991 ê kefite diqada sîtemê cîhanî da û rojane eger ne bêjîn bi dehan dê ya rast bît mehane bi dehan şand dihemî bîyavên karî da qesta Kurdistanê diken û temetî wan yan pitir jiKurdistanê jî derdikevin û mîna aşikira mebest pê ew hîvî û umêdin yên li serê gutarê behsê hindek ji wan hatî ye kirin.

Ya girêdayî rewşa roşinbîrî wek têgeh heta nuke û bi taybet piştî sala 2003 ê bi sedan şandên cura û curên roşinbîrî jiKurdistanê qesta welatên cîhanê kirî ye her bigire jikurîya başûr heta digehîte ustiralîya û emirîka û welatên ewrpa rojava û berovajî jî temetî wan yan pitir şand jider ve yî Kurdistanê jî hatîne herêma Kurdistanê û dîsan mebest jê ew umêd wihîvî bûn yên hatîne behskirin, ya girêdayî şandên bîyanî yên qesta Kurdistanê kirî dibît heta radekî mebesta xwe bi cih înabît û çendek ji roşinbîrî ûkeltûr û rewşt û tîtalên me (çi baş çi xirab) wergirt bin ûkurd mîna milletekê nû û jibin tuza dîrukê derikeftî bi şêwekê dî hatibine nîyasîn.

Lê ya girêdayî şandên me yên delîve bo hilkeftî digel kumeka kesan qesta der ve yî welat biken her xudê dizanît çi behse ûç merem ûmebest bi çuna wan hene, li berahyê eger hevberikirinek dinavbera bajêr wideverên cuda cudayên Kurdistanê da bihêtekirin dê aşikira bît ku hewlêrê behra her mezina pêk înana şandan hebûye û her ev dîyardebûye li ser zarê xelkî hatî ye gutin (kesê hewlêrî nemaye ne çûye kurîya) û bi hevberikirin aşikira dibît ku behra devera behdînan û parêzgeha Dihokê hejartirîn devera Kurdistanê ye bi pêk înana şandan û çona jider ve û delîve pitir bi bajêrên dîtir hatî ye dan û eve bi xwe curekê zordarî ye û cudahyê ye dinavbera welatî yên Kurdistanê da dihêtekirin û çi pîverên li berçavgirtina şîyan û şarezayî û taybetmendîyan û durê nînin û vekulîn jî li ser hinartina şandan

nîne kesek li cihê kesekê dîtir bihête dest nîşankirin.

Ew şandên hatîne hinartin bo der ve çi dibîyavê peywendî yên kesayetî da çi li ser astê wan daxwazên bo sazî û dezgehên hikumeta herêmê yan rêkixirawên serbixu û ne mîrî wirêkxisitî yên cemawerî wipîşey da dihên peywendî yên kesayetî û desthelat û takirewî û birîyarên kurekî û ne zanisitî mifayê pêdivî jihnartina van şandan nehatî ye dîtin û navên hindek kesan wek tak (bara pitir berpirsin) dûbare wisêbare bûyine û heye lez li seredanekê bihête kirin da bi seredana dîtirra bi gehît û ew delîve bo kesekê dîtir nemînît û hizir dihindê da nahête kirin ku nav mişe bibin û delîve bi zêdetirîn kesan wekî tak bihête dan û ev beheşte li ser zortirîn rêja kesan bihête lêkivekirin.

Serbarî kêmî ya cihên xwe dinav şandan da dibînin girê û astenga here mezin jî helbijartina bi leza afirtan e bo pişkdaryê divan şandan da, her çewan bît çona afiretan guneh û tawan nîne lê pişka wan deh carikî temet ya regezê nêr bît eve jî cure zordarîyek e her wek ya berî nuke li jideverê bo devereka dî dihête kirin û jiblî afiretê divêt kesekê nizîk wek (mehirem) digelida bît û eve barî girantir lê diket û heman dem jî mifayên seredanê û bicih hatina armancên hinartinê jinav dibet û delîvê ne bi tinê jikesekî belku pitir jitakekî dibet û dibîte egirê here serekyê parçekirina şandî.

Ew şandên hatîne hinartin û bo rojên dirêj mayne li welatên pêşkeftî û serbor lê diser raburîn ûkelturê wan dîtî piştî vegerîyana xwe çi pêşkêşî wî xelkî kirî ye yên jipêş ve çwîn (li peyî qanunê divêt şand niwênerîya hindek kesan biket yên li dezgehê wî kardiken) ûçenda jiwan şarezayî ya xu pêşkêşî karmendên dezgehê xwe kirî ye ûçendan simînar û wirikşûp bo karmend uwendamên dezgehê xwe vekirîne û eger ew jî dişîyanda nebît dezgeh van cure xul û simînaran rêkibêxît çend jivan kesan şarezayî ya xwe dikarê xweyê rojaneda bikarînaye? Yan vê seredanê wivê delîvê çend li şîyanên wî û dencamda şarezayî ya wî zêdekirî ye? Yan jî çend li karê xwe zêdekirî ye? Çend caran kesên ne peywendîdar bi karê şandî ve kirîne dinavida û hatîne hinartin? Çend caran nav dişanda da dûbare bwîne û pişkdarî diçend karên jêk cuda da kirîne??

Eger bersivên erênî bo van pirsîyaran nebin ûguman tê nîne ku (çi caran jî bersiv bo nabît) raman ew e ku hinartina şandan jiKurdistanê bo welatên cîhanê her bo bêhn vedan û gerîyan û seyran û dîtina welatên cîhanê ye, peywendîya çona şandî bi karî û pêşvebirina şîyanan ve ya sist û lawaze û meremên veşartî li pişt hene ûkarî çi girêdan pêve nîne belku bargiranîyek e bo hikumetê û budca wê û peydakirina valatyê ye disîtemê rojaneyê karî da widwîrikeftina jifermangeh û dezgehan û mezaxtina dem ûşîyan û diravane.